Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :474 www.ronahi.net/ku/ 24- Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Serhed, diyarê berf, bager û lehengan



Berf, bahoz û serma; her sê zalimên Serhedê. Mirov tenê bi pîvanekê dikarin li ber van rabin. Ew jî; zanatî ye. Yanî eger tu zanibe li dijî kê û çi têdikoşe, hingî tu têk naçe.

**EWLADÊ XAS Ê MILAZGIRÊ**

Endamê Konseya Leşkerî ya HPG'ê Hasan Eren (Sîdar Malazgîrt) sala 2008'an li Çiyayê Tendurekê yê Agiriyê di şer de şehîd bû. Sîdar Malazgîrt sala 1978'an li gundê Oxçiyan ê navçeya Milazgir a Mûşê ji dayik bû. Di nava malbateke welatparêz de mezin bû. Mezûnê dibistana navîn e. Salên 90'î gav avêt nava refên têkoşîna şoreşgerî ya demdirêj.

Bi dilsoziya xwe ya bi hevrêyên xwe, bi keda xwe ya li nava têkoşînê û bi tecrûbeya xwe ya di şer de her bi pêş ket.

**DI EMREKÎ BIÇÛK DE LI SERHEDÊ DEST PÊ KIR**

Di emrekî biçûk de, sala 1992'an ku 14 salî bû li Eyaleta Serhedê dest bi gerîlatiya Kurdistanê kir. Di demeke kin de bi dilê xwe yê pak û çalak, hem ji aliyê rêxistinî hem jî ji aliyê fîzîkî ve bi pêş ket.

**QADA RÊBERTÎ Û VEGERA LI SERHEDÊ**

Çû qada Rêbertî û demekê li wir perwerde dît. Piştî perwerdeyê li Eyaleta Serhedê vegeriya û xwest têkoşîna xwe ya gerîla xurt bike, bi tecrûbe û danheviya xwe pratîkeke serketî biafirîne. Di nava şer de her bi pêş ve çû û bi erk û berpirsyariyê rabû.

Bi keda xwe ya li Eyaleta Serhedê re hêza gerîla her çalak kir. Bû şervanekî leheng, gerîlayekî hosta û ket dilê hemû hêzên gerîla. Bi aliyê xwe yê îdeolojîk û rêxistinî, bû yek ji şervanên xeta Rêbertî.

**PIŞTÎ 15 SALAN BÛ YEK JI FERMANDARÊN ARTÊŞÊ**

Bi tecrûbe, berpirsyarî û perwerdeyên bi salan ên di nava şer de, roleke girîng lîst. Bi temsîliyeta xwe ya şoreşgeriya xetê, bi keda xwe ya mezin û sekna xwe ya li nava artêşê, piştî 15 salan bû yek ji fermandarên artêşê. Di Konferansa 4. a HPG'ê de ji bo Konseya Leşkerî ya HPG'ê hate hilbijartin.

**LI ÇIYAYÊN SERHEDÊ VEGERIYA**

Sîdar Malazgîrt bi vê erka mezin û giran li çiyayên Serhedê vegeriya û ji bo geşkirina têkoşîna azadiyê xebitî. Li gorî HPG'ê, Sîdar Malazgîrt yek ji wan şoreşgeran e ku di jiyan û pratîka şer a Eyaleta Serhedê de wê her tim mînak bê dîtin.

**DA SER ŞOPA EGÎD**

Kekê wî Bûrhan Eren sala 2014'an li ser gora wî ya li gundê Oxçiyanê di merasîma bîranînê de got, "Hevalê Sîdar da ser şopa hevalê Egîd. Ew jî tevlî karwanê şehîdan bû. Ji bo jiyaneke bi rûmet û paşerojeke azad berê xwe da çiyê. Divê em jî çand û zimanê xwe ji bîr nekin û bidin ser şopa wan. Em ê her tim xwedî li şehîdên xwe derkevin."

**EVÎNDARÊ SERHEDÊ BÛ, EVÎNDARÊ KURDISTANÊ BÛ**

Sîdar Malazgîrt di rojnivîska xwe de dipirse, "Gelo pêkane ku haya mirov ji Kurdistanê hebe, lê nebe aşiqê wê?". Bi bîr dixîne ku Kurdistan erdnîgariyeke bi heybet e, welatê rojê ye, çavkaniya şaristaniyan e û şahidê şer û lehengiyên mezin e.

Diyar dike ku di serdema heyî de jî hembêza xwe ji zarokên agir û rojê re vekiriye, bi vî rengî kevneşopiya berxwedanê didomîne. Em bi rojnivîska Sîdar Malazgîrt dewam bikin: "Bi vî rengî, hesabpirsên dîrokê kîna xwe li dijî neheqî, zalim û mêtingeriyê nîşan dane. Xiyanet û berxwedan li ser vê bingehê di her serdemê de derketine holê û serhildanan her tim giyan dane jiyanê. Xwîna dirije Kurdistanê sor dike û Kurdistana min a bedew ne xerîbê vê ye. Çiya, kevir û çemên Kurdistanê şahidên vê yekê ne. Dîroka ku bi hezaran salan didome, navê vê rastiyê ye. Ez jî niha li diyarê vê rastiyê me."





**SÊ ZALIMÊN SERHEDÊ**

Sîdar Malazgîrt ewladê Serhedê ye, gerîlayê Serhedê ye, fermandarê Serhedê ye, aşiqê Serhedê ye, lê haya wî ji zor û zehmetiya Serhedê jî heye. Di rojnivîska xwe de qala vê zehmetiyê û rêya çareseriyê dike: "Serhed...

Diyarê pûk, berf û bahoza dawî lê nayê...

Dîsa di rojeke wiha de ku ba û bahoz rabûye, em gihîştin cihê kampê. Mehek di ser wê rojê re derbas bû. Zivistan mîna her carê, zivistana Serhedê ye... Berf, bahoz û serma. Sê şervanên zalim ên zivistanê. Dema ku her sê bi hev re xwe nîşan dide, hêzeke gelekî mezin derdikeve holê. Di meheke wiha de, di rojeke ku ev her sê şervanên zalim bi hev re xwe dan der, em gihîştin kampê. Mirov tenê bi pîvanekê dikarin li ber van rabin. Ew jî; zanetî ye. Yanî eger tu zanibe li dijî kê û çi têdikoşe, hingî tu têk naçe.

**ŞERÊ DESTPÊKÊ YÊ SERKETINÊ**

Di herikîna dîrokê de gelek caran hatiye dîtin; eger wiha nebe, hêza te çiqasî mezin be bila bibe, tu nikare li hemberî van her sê şervanan bi ser bikeve. Her gerîlayeke/î Serhedê divê destpêkê di vî şerî de bi ser bikeve. Ev yek di heman demê de tecrûbeya destpêkê ye. Şerê her sê şervanan bi sir û rewşa nediyar tijî ye. Ev her sê şervanên xwezayê carna bi hev re, carna jî bi tena serê xwe şer dikin.

**BERF LI ÇIYAYÊ AGIRÎ QET NAQEDE**

Ev her sê şervan bi giranî li Araratê dibin berf, li Tendurekê dibin bahoz, li Çemçeyê dibin serma. Berfa Agirî qet naqede. 12 mehên salê timî heye. Yekane şervanê ku têk naçe ew e.

Bahozên dîn û har parçeyekî Tendurekê ye. Ya jî navekî din ê Tendurekê ye. Di wan kêliyên ku mirov qet ne li bendê ye xwe didin der. Di nava van şervanan de yê herî dînik ew e.

**RÛYÊ STÊRKAN LI KEN E, LÊ EW LÊ DIDE**

Şervanê bê rehm ê Çemçeyê serma ye. Bi taybetî di bêdengiya şevê de derba xwe lê dide. Dema ku stêrkên li ezmanan li te dikenin, ew bi bêdengî şer dike, diqerisîne û derba xwe li her kesî dixe.

**DÎTINA HER SÊ ŞERVANAN**

Piştî nîvro em ê bi rê biketina. Her hevalên di nava koma ji 15 kesî de, kêm zêde bi cidiyeta rewşê zanîbûn. Ji ber ku her sê bûbûn yek û li meydana şer li benda me bûn. Ji bo dijmin bi me nehese, diviyabû em li ber van her sê şervanan rabûna. Tevî ku hesab û amadekariyên me hebûn jî, serketin wê di pratîkê de diyar bibûya. Bahoz bi rengekî dîn û har li me dida. Berî bibe şev diviyabû me xwe bigihanda cihê kampê.

**DEM LI DIJÎ ME BÛ**

Di saeta duyemîn a meşê de me rêya xwe şaş kiribû û hêviya me ya ji bo dîtina cihê kampê hêdî hêdî kêm dibû. Vê yekê şensê serketinê yê şervanên xwezayê zêde dikir. Dem li dijî me bû. Di vî şerî de eger li me bibûya şev, ev ê bihata têkçûnê. Haya me hemûyan ji vê hebû. Lê belê kes li ser vê mijarê nediaxivî. Em nêzî kampê bûbûn, lê belê mij, bahoz, berf û serma bûbû sedem ku rewş nediyar be.


**PIRSA KU EM HEMÛ LI BENDA BERSIVA WÊ BÛN**

Em li ku ne?

Pirsa ku em hemû li benda bersiva wê bûn, ev bû. Dema ku me ev bersiv dît, wê hedefa me jî eşkere bibûya. Belê, careke din pîvana 'eger tu zanibe tu li ku ye, tu yê zanibe bi ku ve biçe' derketibû pêşiya me. Şerek, Serhedek û rastiyeke din a Tendurekê... Ya rast, rastiya mirovê têkoşer bû. Zehmetî dibe sedem ku mirov têbikoşe, têkoşîn jî mirovan azad dike..."...*ANF*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 474 24- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Dagirker milkê Efrîniyan li bazaran difiroşin



Artêşa Tirk a dagirker bi çeteyên xwe piştî ku Efrîn dagirkirin dest bi her awayî kiriyarên dij mirovî kirin. Dagirker niha jî li gundên Efrînê diziyê dikin û malên ku didizin li bazaran difroşin. Hat ragihandin milkên welatiyên ku didizin li Cerablûs, Bab, Ezaz, Efrîn û Raî bazarên ku ava dikin, difiroşin bazirgan û çeteyan.*R-2*

# SÛSÊ BER KETINÊ YE, RIZGARKIRINA HECÎN NÊZÎK E

**Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê bi navê Şerê Tunekirina Terorê ku di 11'ê Îlonê de hatibû destpêkirin bi hemû leza xwe berdewam dike. Şervanên QSD'ê bi pêş de diçin û rizgarkirina Hecînê nêzîk buye.**

### LI NAVENDA SÛSÊ ŞER GIRAN E

Şervanên QSD'ê piştî ku demek bû bajarokê Sûsê dorpêç kiribûn ketin nava bajarok. Navenda Çapemeniyê ya QSD'ê, ragihand ku hêzên wan roja duşemê ketin nava bajarokê El-Sûsê. Hat ragihandin ku di nava bajarokê Sûsê de di navbera şervanên QSD'ê û çeteyan de şerên giran diqewimin.

### MAYÎN HATIN BÊ BANDOR KIRIN

Ji aliyê din ve, tevî şerên dijwar QSD sivîlan rizgar dike û mayînên ku çeteyan çandine radike. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD'ê daxuyaniyekê diyar kir ku Yekîneyên Taybet ên QSD'ê di xebatên paqijkirina gundên Dêrazorê de gelek mayîn û bombeyên ku çeteyên DAIŞ'ê bi cih kiribûn, bê bandor kirin. *R-2*



## HPG'ê lê da, 9 leşkerên Tirk hatin kuştin



Li Bakur û Başûrê Kurdistanê çalakiyên gêrîlayên HPG'ê li dijî artêşa Tirk a dagirker berdewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên vê dawiyê yên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand. HPG'ê di daxuyaniyê de diyar kir ku li Barzanê 5 û li Sêrtê jî 4 leşkerên Tirk hatin kuştin. *R-2*

## Fermandarê Emerîkî: Welatiyên xwe yên DAIŞ'î bibin



Fermandarê Operasyonên Taybet ê Emerîkayê Bathrick Roberts ji Brîtanyayê xwest ku her du welatiyên xwe yên ku tev li DAIŞ`ê bûbûn û niha li cem QSD`ê girtî ne, bixwaze. Roberts diyar kir ku QSD û DYA bi awayekî çalak dixebitin da ku wan "kujeran" vegerînin welatê wan û li wir bikevin zindanê. *R-2*

## Projeya Tevgera Azadî ji bo çareseriyê girîng e



Di 17'ê Cotmeha 2018'an de Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistan projeyek ji bo çareseriya pirsgirêkên Iraq û Herêma Kurdistanê pêşkêşkir. Siyasetmedarê Başûrê Kurdistanê Mihemed Emîn Pênciwênî diyar kir ku projeya Tevgera Azadî ji bo çareseriya pirsgirêkên Iraq û Herêma Kurdistanê pêngavek girîng be. *R-4*

## Li Îdlibê av ji nûve germ dibe

Rûsya û Tirkiyê li hev kiribûn ku heta 15'ê Cotmehê li Îdlibê herêma tampon ava bibe û çete wê ji herêma mijara gotinê vekişiyana. Tevî ku wexta hatiye diyarkirin temam bûye, hîn peyman bi cih nehatiye anîn. Hêzên rêjîma Sûriyê jî wê herêmê dest bi tetbîqatê kirin. Çavkaniyekî leşkerî yê Sûriyê diyar kir eger cîhadîst ji herêmê venekişin, wê rojên bê operasyon dest pê bike." *R-4*

## Deste, 1'ê Mijdarê dest bi xebatê dikin



Meclisa Rêveber a Desteyên Rêveberiya Xweser ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê civîna xwe ya yekemîn li avahiya Desteyên Rêveberiya Xweser a navçeya Eyn Îsa lidarxist. Hevserokên Meclisa Rêveber ên Rêveberiya Xweser Ebid El-Mehbaş û Bêrîvan Xalid û Hevserokên 9 desteyên girêdayî wê beşdarî civînê bûn. Di civînê de biryar hat girtin ku deste di 1'ê Mijdarê de dest bi xebatê bikin. *R-2*

## Herêmên di bin kontrola PDK'ê de bûne navendên MÎT'ê



Dewleta Tirk xaka Başûrê Kurdistanê kiriye navenda îstixbarat û karê sîxûriyê yê MÎT'ê. Li gor nûçeya di rojnameya Jiyan de Dewleta Tirk li bajarokê Amêdiyê yê Başûrê Kurdistanê 5 navendên MÎT'ê ava kiriye û hemû cûre çekên giran lê bi cih kiriye. Nerazîbûna gelê başûr ya li dijî van baregehên dagirkeriya Tirk jî zêde dibe. *R-5*



## Rêveberiya nû ya PADÊ soza bilindkirina têkoşînê da

Di 20'ê Comtehê de 2. Kongreya Partiya Azadî û Demokrasiya Êzidiyan (PADÊ) bi beşdarbûna 300 delegeyan pêk hat. Emer Saleh careke din bû serokê PADÊ. Rêveberiya nû ya PADÊ piştî civîna xwe ya yekemîn daxuyaniyek da û diyar kirin ku ew ê di dema pêş de jî xebatên xwe yên ji bo civaka Êzidî hê zêdetir bikin. *R-4*

## Divê gel li ser kooperatîfan perwerde bibe

Çend salên dawiyê de xebatên kooperatîfan li Rojava û bakurê Sûriyê pêşdikeve. Lê hê jî di asta ku tê xwestin de sîstema kooperatîfan rûneniştiye û ji aliyê civakê de girîngiya wê nehatiye fêhmkirin. Berpirsyarê Mala Kooperatîfan a Serêkaniyê Fadil Bozan diyar kir divê gel li ser girîngiya kooperatîfan were perwerde kirin. *R-6*

# Şervanên QSD'ê ketin Sûsê, şer dijwar e

**Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê bi navê Şerê Tunekirina Terorê berdewam dike. Şervanên QSD'ê piştî ku demek bû bajarokê Sûsê dorpêç kiribûn ketin nava bajarok. Hat ragihandin ku di nava bajarokê Sûsê de di navbera şervanên QSD'ê û çeteyan de şerên giran diqewimin.**

Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di çarçoveya qonaxa dawî ya pêngava dijî çeteyên DAÎŞ'ê de ketin nava bajarokê El-Sûsê.

Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê bi navê Şerê Tunekirina Terorê berdewam dike.

Li gorî Navenda Çapemeniyê ya QSD'ê, hêzên wan roja Duşemê ketin nava bajarokê El-Sûsê û li nuqteyên çeteyên DAÎŞ'ê didin.

Tê gotin, li bajarok şer giran e. Çavkaniyên QSD'ê ragihandin ku hêzên QSD'ê bi pêş ve diçin.



### WESAYÎTEK BOMBEBARKIRÎ KET DESTÊ QSD'Ê

Ji aliyê din ve şervanên QSD`ê êrîşa çeteyan a bi wesayîta bombebarkirî têk birin û wesayîtekî bombebarkirî ya çeteyan jî kete destê şervanan.

Li gorî agahiyên ku QSD`ê dane, çeteyên DAIŞ`ê hewl dan bi wesayîtekî bombebarkirî êrîşî noqteyên şervanên QSD`ê yên bajaroka El-Sûsê bikin. Şervanên QSD`ê êrîşa çeteyan têk birin û çeteyê êrîşkar hate kuştin.

Hate ragihandin ku wesayîta bombebarkirî ya çeteyan kete destê şervanên QSD`ê.

### QSD'Ê HÊJMAREKE ZÊDE MAYÎN RAKIR

Yekîneyên taybet ên QSD'ê di xebatên paqijkirina gundewarên Dêrazorê de gelek mayîn û bombeyên ku çeteyên DAIŞ'ê bi cih kiribûn, bê bandor kirin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD'ê daxuyaniyeke nivîskî li ser malper xwe ya fermî weşand.

Navendê di daxuyaniyê de ragihandin ku yekîneyên taybet ên hêzên wan di çarçoveya qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ya 'Şerê Tinekirina Terorê' de hêjmareke mayîn û bombeyên ku çeteyên DAIŞ'ê bi cih kiribûn bê bandor kirin.

Di daxuyaniyê de hate gotin: "Di çarçoveya 'Şerê Tinekirina Terorê' de yekîneyên taybet ên hêzên me bi armanca ewlehiya gundên rizgarkirî û paqijkirina gundan ji bermahiyên çeteyên DAIŞ'ê de, li derdora gundê Cirdî yê li beranberî gundê Ebû Hemam ê nêzî bajaroka Behrayê hejmareke mezin mayîn û teqemenî yên çeteyên DAIŞ'ê bê bandor kirin."

Navendê 'ê ragihand ku teqemeniyên hatin bê bandorkirin ji gelek cureyên mayîna pêk dihatin û hejmareke mezin hatibûn bicihkirin. Navenda ragihandina QSD`ê diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê ev mayîn di dema tozê de li riyên sereke yên ku şênî rojane bi kar dianîn çandibûn da ku komkujiyan bikin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD'ê diyar kir ku Yekîneyên Endezyariya Leşkerî li herêmên şer û eniyên paş xebatên xwe rojane dimeşînin û ragihand ku cihê mayînan bi hevkariya welatiyan hatin keşfkirin û bê bandorkirin.

## HPG'ê lê da, 9 leşkerên Tirk hatin kuştin



Li gorî daxuyaniya HPG'ê li Barzanê 5 û li Sêrtê jî 4 leşkerên Tirk hatin kuştin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên vê dawiyê yên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da:

"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de roja 21'ê Cotmehê li dijî artêşa TC a dagirker çalakî li dar xistin.

Hêzên me saet 06:30'î li herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê li dijî leşkerên dijmin ên li ser girê Bayrakê çalakiyeke sûîqestê kirin. Di encamê leşkerek hate kuştin.

Saet 10:30'î hêzên me li dagirkerên li Tepê Xwedê yê li herêma Barzanê xistin. Derbên xurt li kozikên dijmin hatin xistin û 4 leşker hatin kuştin.

Artêşa TC a dagirker roja 18'ê Cotmehê li herêma Herekolê ya Sêrtê bi gelek tîmên xwe yên taybet, cerdevan û kontrayên xwe li qadên Şehîd Berxwedan, Şehîd Canxurt, Korîdora Soriyan, Deriyê Egîdan, Deriya Çeperê û Destesorî derket operasyonê. Di vê operasyona berfireh de, hêzên me roja 20'ê Cotmehê saet 7'an di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de li dijî yekîneyeke operasyonê çalakiyek pêk anîn. Ji du baskan ve li yekîneya dijmin hate xistin û di çalakiyê de 4 leşkerên dijmin hatin kuştin."."

## Di encama êrîşê de, generalekî Emerîkî birîndar bû



Hate ragihandin ku hefteya borî li Kandaharê ya başûrê Efganîstanê generalekî Amerîkî di êrîşa Talîbanan de birîndar bûye.

Li gorî daxuyaniya mîsyona NATO'yê ya Efganîstanê di êrîşa Talîbanan a li dijî parêzvanên waliyê Kandarê de 13 kes birîndar bûn û di nava birîndaran de generalê Amerîkî Jeffrey Smîley jî heye.Hate diyar kirin ku li Kandaharê li dijî civîna leşkerên di asta bilind de êrîş pêk hatiye û di êrîşê de derbeyek giran li parazvanên ewlehiyê hatiye xistin. NATO'yê diyar kir ku genarelê Amerîkî veguhestine nexweşxaneyekî Elmanyayê û metirsiya li ser jiyana wî tûne.

Hate diyar kirin ku fermandarê hêzên NATO û Amerîkayê yê Efganîstanê Scott Mîllner jî beşdarî civînê bûye û di êrîşê de bêyî ku birîndar bibe rizgar bûye.

General Abdûl Razîk fermandarê Kandahar û şefê îstixbareta eyaletê û rojnamegerekî Efgan di êrîşê de hatibûn kuştin.

Talîbanan êrîş li xwe girt û raigihandin ku Mîller û Razîk kirine hedef. Mîller piştî êrîşê rojekê daxuyanî da û got 'hedef ne ez bûm'.

## Deste, 1'ê Mijdarê dest bi xebatê dikin



Desteyên Rêverberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê 1'ê Mijdarê dest bi kar bikin.

Meclisa Rêveber a Desteyên Rêveberiya Xweser ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê civîna xwe ya yekemîn li avahiya Desteyên Rêveberiya Xweser a navçeya Eyn Îsa ya girêdayî Kantona Girê Spî li dar xist.

Hevserokên Meclisa Rêveber ên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebid El-Mehbaş û Bêrîvan Xalid û hevserokên 9 desteyên girêdayî wê beşdarî civînê bûn.Beşdaran rewşa siyasî ya herêmê, pêşketinên leşkerî û her wiha girîngiya desteyên Rêveberiya Xweser di rêvebirina karûbarên rêveberiyê li herêmên Bakurê Sûriyê gotûbêj kirin.


Piştre mekanîzmaya meşandina xebatên desetyan nîqaş kirin.

Beşdaran li hev kirin ku heftê carekê roja pêncşemê civîna asayî yên desteyan werin lidarxistin.

Her wiha girîngiya koordîneyê di navbera deste û her 7 komîteyên girêdayî wê hate destnîşankirin.

Di dawiya civînê de beşdaran roja 1'ê Mijdarê, weke roja destpêkirina dewama fermî ya desteyan diyar kirin.

## Dagirker milkê Efrîniyan li bazaran difiroşin



Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê milkên şêniyên Efrînê li bazaran difiroşin.

Piştî ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê Efrîn dagir kirin, bi her awayî kiryarên xwe yên hovane didomînin. Dagirkerên ku milkên welatiyan li navenda bajêr dizîn û niha jî li gundan diziyê didomînin.

Çavkaniyek herêmî ji ajansa ANHA'yê re ragihandiye ku dagirkeran li herêmên ku dagir kirine wekî Cerablus, Bab, Ezaz, Raî û Efrînê mezadan (bazar) organîze dikin û milkên welatiyan difiroşin.

Heman çavkanî diyar kir ku piraniya tiştên ku li wan bazaran tên firotin, erebe û motorsîklêt in.

Her wiha destnîşan kir ku milkên welatiyan ji bazirganên sûka reş û çeteyan re tên firotin.

Li gorî heman çavkaniyê, milkên ku li mezadan neyên firotin, bazirgan dikirrin û diyar kir ku çete gelek pere ji van mezadan werdigirin.

## Fermandarê Emerîkî: Welatiyên xwe yên DAIŞ'î bibin

Fermandarê Operasyonên Taybet ê Amerîkayê Lîwa Bathrick Roberts ji Brîtanyayê xwest ku her du welatiyên xwe yên ku tev li DAIŞ`ê bûbûn û niha li cem QSD`ê girtî ne, bixwaze.

Li gorî rapora rojnameya The Telegraph a Brîtanyayê fermandarê Operasyonên Taybet ê Amerîkayê Lîwa Bathrick Roberts ji Brîtanyayê xwest ku her du welatiyên xwe yên ku tev li DAIŞ`ê bûbûn û niha li cem QSD`ê girtî ne, bixwaze.





Her du çeteyên mijara gotinê, navê yekî El-Şafî û navê yê din jî Kotî ye. Erka her du çeteyan ew bû ku serê girtiyên biyanî qut bikin.

Lîwa Bathrick Roberts diyar kir ku QSD û DYA bi awayekî çalak dixebitin da ku wan "kujeran" vegerînin welatê wan û li wir bikevin zindanê. Her wiha Bathrick Roberts da zanîn ku ev biryar ji bo hemû dewletên ku welatiyên wan di nava DAIŞ`ê de hene, derbasdar e.



# Armanca Cegerxwîn şiyarbûna gelê Kurd bû

**Bi boneya salvegera helbestvanê Kurd yê nemîr Seydayê Cegerxwîn çalakiyên bîranînê tên lidarxistin. Welatiyên gundê Til Şeîr yê girêdayî Tirbespiyê ku Cegerxwin li gundê wan dimîne behsa wî kirin û diyar kirin ku Cegerxîn ji wan re gotiye ku armanca wî hişyarbûna gelê Kurd e. Welatiyan diyar kirin ku Cegerxwîn tesîreke mezin li wan kiriye.**

Şêniyên gundê Til Şeîr diyar kirin ku helbestvanê Kurd Cegerxwîn bandoreke mezin li wan kir û destnîşan kirin ku armanca Cegerxwîn ew bû ku gelê Kurd hişyar be.

Seydayê Cegerxwîn yek ji helbestvanên navdar ên Kurd e. Helbestvanê kurd ê nemir Cegerxwîn (Şêxmûs Hesen) di sala 1903'an de li gundê Hesarê yê girêdayî herêma Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê ji dayik dibe. Cegerxwîn piştî ku ji Bakurê Kurdistanê sirgun dibe derbasî Rojavayê Kurdistanê dibe û li gelek gund û bajaran digire. Li gundê Til Şeîr ê navçeya Tirbespiyê xwendina olî li ber destê Mele Îbrahîm Şêxmûs dixwîne.

Piştî xwendina xwe ya olî diqedîne li gelek cihên Kurdistanê geriya û car caran serdana gundê lê xwendiye dike.

Cegerxwîn pirtûka (Rêgezên Zimanê Kurdî) û ferhengeke zimanê Kurdî ji du beşan derxist, her wiha gelek berhem û helbestên wî yên bi zimanê Kurdî hene.

Seydayê Cegerxwîn di berhemên xwe de, qala têkoşîna gelê Kurd dike.

Seydayê Cegerxwîn 22'ê Cotmeha 1984'an li Stokhomê wefat kir, cenazeyê wî bi merasîmeke mezin li mala wî ya li bajarê Qamişlo tê veşartin. Her dem welatî diçin serdana mala wî ku cenazeyê wî lê hatiye veşartin.

Bi boneya salgera wefata seydayê Cegerxwîn welatiyên gundê Til Şeîr ên ku bi Seydayê Cegerxwîn re jiyane diyar kirin ku Cegerxwîn bandoreke mezin li wan kir.

Jina bi Sakîna Hecî Silêman Yûsif got, "Cegerxwîn di sala 1974'an 3 mehan li mala me ma, dema xwe bi nivisandinê derbas dikir, rojê tenê saetek an du saet xew dikir."

Sakîne wiha got: "Dema min sedema kêm xewê ji Cegerxwîn pirsî, got; keça min ez ê hewl bidim bi helbestên xwe gelê Kurd hişyar bikim."

Seydayê Cegerxwîn pirraniya dema xwe li mala Dara Yûsif Ebdê yê helbestvan û sazvanê helbestên Cegerxwîn derbas dikir. Dara diyar kir ku Cegerxwîn bi helbest û axaftinên xwe şerê kevneşopiyên eşîrtî, zulma axayan û rêbazên şaş ên oldaran dikir.



Li gorî ku Dara ji bavê xwe Yûsif bihîstiyê; bavê wî û Cegerxwîn li gundê Til Şeîr digeriyan û li efserekê Fransî rast hatin, Cegerxwîn nêzî du saetan efserî Fransî re nîqaş kir. Piştî demekê efserê Fransî pirsa Cegerxwîn ji Yûsif Ebdî re dike û jê re got, mejiyê Cegerxwîn cewherekî giranbuha ye.

Cemal Mehmûd Osê 68 salî ye, ji gundê Til Şeîr e, Osê bi Yûsif Ebdî re bi bandor dibe û fêr dike ku helbestên Cegerxwîn saz bike.

Cemal Osê got: "Helbestvanê Kurd Cegerxwîn bandoreke mezin li min kir. Lê Cegerxwîn digot, wî bi helbestê xwe nedikarî gelê Kurd hişyar bike."…*ANHA*

## *Perwerde û Zaningeh Cihê Têgihiştin û nasnameya civakêye*

**Melek DEMÎRTAŞ**

Bi armanca avakirina sîstemekî hevbeş û bilindkirina asta xwendinê, 1.Konferansa Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin diruşmeya " Zanîngeh qada têgihiştina heqîqet û nasnameya civakî ye" li zaningeha Rojava ya li bajarê Qamişlo ya girêdayî Herêma Cizîrê, bi beşdarbûna bi dehan xwendevanên Zanîngeha Rojava, Kobanê û Efrînê, her wiha Desteyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, KPC-Demokratîk, Rewşenbîr, endamên Akademiyên perwerdê ser du rojan hate lidarxistin.

### ARMANC HEVBEŞKİRİNA SÎSTEMÊ Û BİLİND KİRİNA ASTA XWENDİNÊ

Girêdayî mijarê Berdevkê Ragihandina Zaningeha Rojava Mesûd Ehmed ser hazirtî û armanca konferansê ev agahî dan beriya çend mehan li sernaserê Herêmê ji rêveberî û mamostyên zaningehan re civînên mîna yaneyan hate lidarxistin û wiha got: "Di yaneyê de ser sîstma giştî ya hersê zaningehan, rêvebernameya Meclisên Xwendekarên Zaningehên Rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê derxînin gelek nîqaş hatin kirin. Ev yaneya bûne bingeha lidarxistina konferansê û axaftina xwe ser armanca konferansê dewam kir: "Armanc avakirina sîstemekî hevbeş û bilindkirina asta xwendinê, ji bo wê jî dê di warê pêşxistina asta hîndikarî û zaningehan de Saziya Xwendina Bilind dê bê avakirin. Jiber ku ew saziyeke sîstema dersdayînê di peymangeh, fakulte, zanîngeh û akademiyên herêmê Bakur û Rojhilat Sûriyê dişopîne."

Mesûd Ehmed anî ziman ku wekî mêvan 2 mamoste û lêkolîner bi rêya Skypeyê tev li konferansê bûn û wiha bi dawî kir: "Mamostê Zanîngeha Silêmaniyê ya Başûrê Kurdistanê Hewcîn Mele Emîn tevli konferansê bû, pêşniyarên pêşxistina zimanê kurdî, xurtkirina nasîna şoreşa Rojava û tekiliyên di navbera zanîngehên Rojava û başûrê Kurdistan de kir. Di heman demê de jî Zanîngeha Oxfordê lêkolîner Ahmet Kara diyar kir ku şoreşa Rojava Ji cîhane re dibe mînak û ev pêşniyar kir: "Pêşketinên di warê perwerdeyê de civakê jî bi pêş dixin. Di nava şer û êrîşan de perwerdekirina mirovan tê esasgirtin."

### KÊM TÊKÎLÎ SÎSTEMEK HEVBEŞ NEBÛ

Endama Rêvebira Zaningeha Rojava Sîpan Çeto jî ser girîngiya li darxistina konferansê û ava kirina saziya xwendina bilin ev tişt anî ziman û got: "Da ku sîstemek hevbeş ji bo hersê zaningehan û rêxsistin bikin li darxistina wiha konferansê ji bo nirxandina rewş, xebat û perwewrdehiya her zaningehekê girînge, her wiha rapora xwe de didin diyar kirin ku wekî zaningeha Rojava xebatê du salan, Efrîn 3 sala û Kobanê jî yê salekê hate nirxandin û her zaningeha jî xweseriya wê hebû ji bo wê jî di sîstema zaningehan de hevbeşî nebû, sedema bingehîn jî teklî di navbera hersê zaningehan de nebû."

Sîpan bal kişand ser girîngiya konferansê ku Konferansa di demeke dîrokî de ku şoreşek heye pêk hat, di nava mercên şoreşê de sazkirina xebatên zanîngeh û akademîk hem zehmet û hem jî watedar in. Û wiha got: "Da ku van pirsgirêkan derbas bikin û sîstemek hevbeş di hersê zaningehên xwe de avabikin ev konfernas gelek girîng û wate dar, taybet ji bo pêşxistina têkîliyan û asta xwendinê ev bi serê xwe gavek dîrokîye. Sîpan Çeto wiha bi dawî kir: "Biryargitina avakirina xwendina bilind tê wateya serkeftina şorşê, jiber ku bingeha serkeftina şorşê ji pêşxistina hişmendî û zinstê tê; Ji ber ku zaningeh têgihiştin û nasnameya civakê ye."

Encamnameya 1.Konferansa Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hate eşkere kirin û Encamanameya konferansê wiha ye: Delegeyên beşdar bi tevlîbûneke berfireh a 2 rojan vîna xwe ya demokratîk nîşandan. Di encamê de ji bo pergaleke hevpar a zanîngeh û akademiyên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê gaveke dîrokî hate avêtin. Dîsa konferansê de biryardarî hate nîşandan ku li ser vê bingeha bi hêz, her zanîngeh û akademî di warê pergala akademîk de hîn zêdetir asteke bilind ji xwe re weke armanc danin."





## Ma çêkirina klîban ewqas hêsan e?

**Hozan SEYÎDXAN**



Klîp danasîna hilberîna hunermende. Lihev anîna ritim, deng, muzîk û dîmene. Klîp beşek kin ya bi dîmene ku ji bo nasînê hatiye amadekirin.

Di civaka kurd e dîroka çêkirina hunera klîpan ne pir dirêje. Lê tecrûbe ya dîroka kanalên dîtbarî jî hewqas nû nîne. Di bîst û sê salan de gelek kanalên tv'yan hatine vekirin. Ekranên van kanalan derfetik zêrîn ji bo danasîna berhemên hunerî yên hunermendan afirand. Helbet çavê gel û mûzîkhezan li ekrana van kanalane ku berhemê hunermendan yê herî baş û bi bandor tamaşe bike ye.

Beriya salan dengbêjan bi rêya kilaman di nav civakê da rola kanalên dîtbarî jî dilîstin.

Dengbêjan çawa destan û efsaneyan di kilamên xwe de dibêje, hemû merheleyên dîrokê bi rêya kilamên xwe hewqas zelal û sade bi deng, axaftin estetîze dikin. Guhdarvan mest û şaa dikin. Ango dengbêj heman demê bi rêya deng û kilama ji civakê re rola tv'yan jî dianîne cih.

Raste beriya vekirina kanalên tv'yan di nav civaka kurde derfetê çêkirina hunera klîban tunebû. Dezgehên weke prodiksiyonan, organîzeyan yên bikarin derfetê çêkirina kliban ji hunermendên kurd re biafirine tune bû. Ji ber vê egerê hemû kurdan klîp, muzîk, şano û sînema bi rêya kanalê tv ê yên tirkan, ereban û farisan tamaşe dikir û dinasî.

Helbet va rewsa bandorik dîrokî liser civakê û kesayeta kurd çêkir.

Li gel burîna hewqas salên dur û dirêj îro dema em li berhemê hatine afirandin yên hunermendên kurd tamaşe û guhdar dikin, mirov bas bandora texlîtkirina şop, şêwa û awa yê hunermendên pergalên desthilatdar dibîne. Dîse ji ber ku piraniya hunermendên kurd xwe ji zanista hunerê û civakê perwerde nekirine, bîrdoziya hunerê tênegihiştine, berhemê wek klîp û stranên wan ji cewherê hunerî lawaz, ji estetîkê dur, naverokê ve tevlîhevin. Heta dikarê bê gotin gelek klîbên hatine çêkirin, nirxên gel û şoreşê anîne asteke ji rêzê.

Eger lêgera dad û maf ya hunermend tunebe, û nizani be ku ew bixwe li dij pergala desthilatdare, wê afirandina wî û berhemên wî yê hunerî ne yê wî bin. Bi gotineke din hunera wî ne ligorî pîvana civkê be,jêre huner neyê gotin. Berevajî wê hunermend hilbijêre ye, xwe ji zanistê rapeçaye.

Ez wekû çavdêrek bi rêya kanalên tv ê yên kurd 22 du salin bi hezaran stran û klîbên hunermendên kurd di şopînim. Her kêlî û roj çavê mi li derketina çend mînak jî klîbên herî başe. (Bere Hunermendên ku klîpên wa hene û di kanalên tv yan de têne weşandin li min biburînin). Lê mixabin piraniya klîbên hatine çêkirin wek hevin. Yek kopiya yêdine. Ji estetîka hunerî lawazin û durin.

Dîmenên li klîp têne barkirin tevlîhevin û berevajî gotinane.xîtabî hest nakin û gotinên tekstê wan tevlîheve. zimanê di tekstande tê bikaranîn ji rêzeziman dure. Hin klîb hene ku di 5 deqeyên klîp de 5 cure cil û bergan di diguherînin. Liv û tevgera hunermend qebe, her du destên xwe ji derveyî ritma klîb li ba dikin.

Di teksta klîbêda hewqas tevlîhevî heye ku tamaşevan nedikare mijarê nas bike. Di eynî tekstêde navê kurdistan heye, serok heye, gêrîlla , azadî heye, şehîd, şervan heye, jin û mêr heye, evin û sewda heye, şer û aşîtî heye. Ango çuqas pronav hene, hemû mijara yek tekstêne.

Ji bo pêşî li tevlîheviya di klîbande bê girtin, di serî de saziyên çandê, komisyonên hunerî kesên ji hunera klîban fam dikin dikarin bibin alîkar. Heman wextê wê hunermend jî ji bo çêkirina klîbê xwe xwe li wan komisyonan bigirin. Hunermendên ku klîban çêdikin xwe li saziyên an jî kesên profesyonal ên klîb çêker nagirin. Piraniya klîb çêkerên heyî amatorin û vê qadê ji bo dirav bidestxistinê bikartînin. Pîşeya wan ne ya klîb çêkirinê ye. Klîb diheman demê de kurte fîlme. Ji teksta wêre sanaryo dive hebe. Ana gorî mijara tekstê dîmen dive hilbijêre bin û hwd..

kilam û stranên me di bingeha xwe de rastiya civakê û exlaqa civakê dihewîne. Rasterast xîtabî hestê mirovan dike.Hunera kêfê jî tenê xîtabî wê dema bi sînor dike. Vê yekê jî herî baş bi riya klîbên şexsan pêk tîne.

Li dijî vê nêzîkatiyê helwesteke bi hêz ya exlaqî nehatiye dayîn û qada muzîkê û hunera klîban bûye qada populîzmê û sermayeyê.

Yên ku rastiya jiyana kurd, xwezaya ya wî baş nasnekiribe, felsefa tevgera kurd fêmnekiribe û li gorî jiyana heyî bijîn wê nikaribin di qilîbên xwede şehîd, gerîla, evînê, şer, aşitiyê û Rêber Apo bi awayê rast binirxênin.

# Divê gel li ser kooperatîfan perwerde bibe

**Çend salên dawiyê de xebatên kooperatîfan li Rojava û bakurê Sûriyê pêşdikeve. Lê hê jî di asta ku tê xwestin de sîstema kooperatîfan rûneniştiye û ji aliyê civakê de girîngiya wê nehatiye fêhmkirin. Berpirsyarê Mala Kooperatîfan a Serêkaniyê Fadil Bozan diyar kir divê gel li ser girîngiya kooperatîfan were perwerde kirin.**






Berpirsyarê Mala Kooperatîfan a Serêkaniyê Fadil Bozan diyar kir ku gelê herêmê bi salan e di sîstemeke bazara şexsî de jiyaye û heta niha baş fêrî sîstema kooperatîfan nebûye û got: "Divê gel di vî alî de bê perwerdekirin."

Kooperatîf yek ji sîstemên aboriya civakî ya demokratîk e. Ji bo ku civak ekonomiya xwe bi pêş bixe û debara xwe bike, kesên di civakê de bi awayekî hevbeş para xwe dixin nava kooperatîfê. Piştî ku par tên komkirin, her kes di wî karî de ked dide û berhema derdikeve jî bi awayekî wekhev tê parvekirin.

Li Bakurê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê jî Rêveberiya Xweser modela aboriya civakê ango kooperatîf pêşxist. Bi xurtbûna Şoreşa Rojava re gel dest bi avakirina kooperatîfan kir. Niha li herêmê bi sedan kooperatîf hatine avakirin. Yek ji herêmên ku sîstema xwe ya aboriya demokratîk ava kiriye jî Serêkaniyê ye. Li Serêkaniyê ji 2014'an ve kooperatîf hatine avakirin.

Berpirsyarê Mala Kooperatîfan a Serêkaniyê Fadil Bozan li ser rewşa kooperatîfan û pêşketina wan axivî û da zanîn ku ew ji bo jiyaneke komînal û aboriya civakî kooperatîfan bi rêxistin dikin û wiha got: "Em ji bo gel civînan çêdikin bê ka kooperatîf çi ye û ji bo çi tê avakirin. Em madî û manewî alîkariyê didin gel. Em projeyên wan dibin cem aliyên peywendîdar."

Fadil girîngiya kooperatîfan nirxand û wiha dewam kir: "Di aboriya şexsî de, berhem a kesekî ye û ne civakî ye. Kesên di wî karî de kar dikin ne endam, tenê wek kole tên xebitandin. Lê di kooperatîfê de her kes kedê dide û rêzê ji keda hev re digirin."

Fadil Bozan diyar ku li Serêkaniyê 15 kooperatîfên çandiniyê, yek ya firinê û yek jî hevgirtin heye û da zanîn ku li herêmê hemû rêxistinên kooperatîfan niha lewaz bûne û wiha axivî: "Hîn gelê me fêrî sîstemeke kooperetîvan nebûye. Ji ber bazara şexsî ku bi salan fêr bûne, bi heman şêweyî nêzî kooperatîfan dibin. Ji gel re perwerde pêwîst e. Divê em sîstema kooperatîfan bi gel bidin fêmkirin."…*ANHA*

## Şaredariya Gel a Şêxmeqsûd lez daye xebatên xwe



Şaredariya Gel a Şêxmeqsûd bi hatina zivistanê re gelek xebat bi encam kir. Şaredariyê ji bo berdewamkirina xebatên sererastkirinê gelek proje daniye pêş xwe.

Bi hatina zivistanê re û ji bo derbaskirina pirsgirêkên li pêş welatiyan, Şaredariya Gel a Şêxmeqsûd li bajarê Helebê gelek projeyên xizmetî daniye pêş xwe. Şaredariyê beriya vê bi demekê, dest bi amadekirina binesaziya taxê, sererastkirina rêyan û paqijkirina rêgaran kiribû.

Şaredariya Gel bi hatina zivistanê re, sûkek sergirtî li aliyê rojhilatê taxê amade dike.

Di nav amadekariyên pêşwazîkirina zivistanê de, Şaredariya Gel bi hevkariya komînên taxê mazotê li welatiyan belav dike. Şaredarî li gorî derfetên heyî dê mazotê hefteyê 2-3 caran belav bike.

Ji bo derbaskirina astengiyên demsala zivistanê, şaredariyê beriya barîna baranê rêyên ku zirar dîtine sererast kirin. Her wiha rêya Sûka Xerbî bi dirêjahiya 175 metrekare sererast kir, rêgar paqij kirin û toreyên ava vexwarinê sererast kirin.

Têkildarî mijarê hevseroka Şaredariya Gel a Şêxmeqsûdê Velantîna Ebdo axivî û bang li welatiyan kir ku bi şaredariyê re bibin alîkar, avê zêde nerijînin û paqijiya taxê biparêzin.

Şaredariyê gelek projeyên sererastkirinê daniye pêşiya xwe. Jê sererastkirina deverên ku di encama topbaranê de zirar dîtine, dirêjkirina ronahiyê li taxê, jinûve avakirina parka herêma El-Eşrefiyê û rakirina bermahiyên şer ji kolanên taxê…*ANHA*

## *Klûba Kaniya Kobanê xebatên xwe pêş dixe*

Klûba Kaniya Kobanê hewl dide zarokên xwedî karînên werzîşî perwerde bike da ku di pêşerojê de bibin lîstikvanên pispor.

Klûba Kaniya Kobanê navê xwe ji stada bajarê Kobanê ya bi navê Kanî wergirtiye. Zarokên bajarê Kobanê tev li klûbê bûne û tîmên taybet ên keçan jî hene.

Zarok li ser şêwazên lîstika futbolê tên perwerdekirin.

Têkildarî mijarê berpirsyarê futbola zarokan Ezet Kendo diyar kir ku ew hewl didin zarokan di temenên biçûk de perwerde bikin da ku ji werzîşê hez bikin.

Tîma Kaniya Kobanê ji 29 lîstikvanan pêk tê. Temenên wan di navbera 6-15 saliyê de ye û mamosteyek wan perwerde dike.

Bi dehan lîstikvanên ku di van du salên avakirinê de ji klûba Kanî derçûne, tev li gelek tîmên din bûne. Her wiha lîstikvana tîma klûbê Firyal Ehmed a 15 salî, xelata baştirîn lîstikvana futbolê ya jin li Bakurê Sûriyê wergirt.



Lîstikvan heftane 2 caran perwerdeyên xwe li stada Kobanê dibînin.

Girêdayî mijarê zarokê bi navê Mistefa Ehmed diyar kir ku ew pir ji lîstoka futbolê hez dike û hêvî dike ku nûnertiya bajarê xwe di hemû boneyên futbolê de bike. Her wiha bang li hevalên xwe kir ku tev li tîmên werzîşê bibin…
*ANHA*

## Desteya Ciwan û werzîşê du piştgirya jinên de berdewam e

**Ferîşte NEZÎR**

Bi armanca alîkarî û piştgirtiya Yaneya Werzîşê ya jinê Desteya Ciwan û werzîşê bi alîkariya Bîroya jin di desteyê de yaneyên çalak di herêma cizîrê de piştgirya xwe dewam dike.

**YANEYA QENDÎL YEKEMÎN YANE DESTURNAME DIGRE**

Desteya Ciwan û Werzîşê û Bîroya Jin di desteyê de piştgiriyê dide Yaneyên çalak di Herêma Cizîrê wekî Yaneya werzîşa jin de berdewam dike. Ku beriya niha jî ji gelek yaneyên ku tevlî şampiyona Baskêtbolê bûn piştgirî dan. Ku encama wê de Yaneya Qendîl a werzîşa jin ku ew yekemîn yaneya jinê ji hêla Yekîtiya Werzîşê ya Herêma Cizîrê desturname werdigire.

Bi armanca piştgiriya yaneyê û peydakirin û berdewamkirina vê alîkariyê û hêzdayîna moralên lîstikvanên ku di refên yaneya Futbolê û bîngbolê dilîzin, Bîroya Jin a Desteyç hemû pêweîstiyên Werzîşê wekî ("taxim" cilên werzîşê, gog û pêlav futbolê).. hwd.pêkêş kirin."

Girêdayî mijarê Hevseroka Desteya Ciwan û Werzîşê Hemrîn Elî ji hemû lîstikvanên jin re daxawz kir ku di çalakiyên werzîşê de dewam bikin, da ku hemû kelêmên li himberî pêşketina wan dibin steng bişkînin û bi serkeftina xwe wan derbas bikin. Jiber ku ev cara yekemîne wekî yane dê beşdarî pêşbirkê kopayê bibin, li gorî navê yaneyê û berwxedenniya ku Rojava û bakur û rojhilata Sûriyeyê daya em layîq bin em asta lîstik û beşdariya jinan xurtir bikin."



**DA BIGHÊJIN ŞAMPİYONÊ ASATA XEBAT XURTIR BIKIN**

Seroka Bîroya Jin a di Desteya Wezîşê de Lîlav Xelîl jî da zanîn ku wê her di alîkarî, piştgirî û şopandina xebat û çalakiyên yaneyê de berdewam bin û wiha got: "Bi armanc ku em bighêjin asta ku tê xwestin pêwîst her xebat û perwerdên xwe çalak bin. Her wiha Seroka Yaneyê Wesîla Xelî jî ev gava bîroya jinê sipas kir û Wesîla tekez kir ku wekî her ji bo serkeftina yaneyê hemû xebatên xwe û asta lîstikvanan xurtir bikin, da ku bighêjin asta herî billind.



## Tecrîd û Rewşenbirî

**Medeni FERHO**

Mijara min dîse tecrîd e. Tecrîd, ne tenê gotinek e, di qirkirina Kurdan de siyasetek nû ye. Trajîk û metirsî ye. Divê werê fêm kirin, ji bo fêmkirinê jî "kûr nîqaşkirin" dive.

Rastiya Kurdan, di destîniya berxwedan û lîderên Kurdan de veşartî ye. Teva ji dîrokê hatine derxistin, em jî, gelek caran bi mêjiyê dagirkeran nêzîk dibin. Rewşek trajîk û sucloyî!...

Îro jî, doh e, pêr e û Tecrîd e!.. Tecrîd rastiya Kurdan e û li Îmraliyê dîl girtî ye. Tecrîd derxistina ji dîrokê ye, berterefkirina xewn û xeyalên Ehmedê Xanî û "manîfestoya hebûnê" ye.

Lewma, bêhtir ji her kesî pêdiviya Kurdan bi zanistê, bi fêrbûn û têgihiştinê heye. Kurdê têgihiştî û zana, divê kirasê xwe bi dirrîne. Dirrandina kirasê li ser bedena mirov, redkirina statuqo ye, darizandina siyaseta înkar û tunekirinê ye, meşa ber bi gerdunê ye.

Kurd, ji her alî ve hatine sucdarkirin û gunehkarkirin... Sucê wan, sosyolojîk, kulturî û dîrokî ye, gunehkariya wan jî di nasname, cografya û olî ye. Ev ne destînî ye, siyaseta şûr e.

Gelên cîhanê, bi zanist, pêxember, serdar, ewliya, embiya, entelektuel û lehengên xwe serbilind in. Kurd cûda ne, nirx û pîroziyên wan jî, li wan qedexe ne. Ji ber nirx û pîroziyên xwe jî sucloyî ne, gunehkar in...

Li Tirkiyê, Kurd û Kurdistanê, nirx, nav û pîroziyên Kurdan qedexe ne, îradeya gel jî qedexe ye, wek Kurd, rûniştina li ser kursî jî qedexe ye. Dagirkerên ku dibêjin, em misilman in, bi Kurdî xwendina Qur'anê, niyaz û nemaz qedexe kirine!.. "Sayin" ji bo lîderên Kurdan qedexe ye!..

Kurd nikarin "amurên hişmendiyê" jî bikarbînin. Suc e!..

Ji sedema ku Ocalan, bi "amurên hişmendiyê" haraket kir, bi komployek navneteweyî dîl hate girtin û dibin tecrîdê de tê girtin. Tecrîda li Imralî, dîrokî û sosyolojîk e, ne tenê fizîkî ye, hiş û ramanî ye, reda "manîfestoya hebûnê" ye. Ev, kuştina ûtopya ye!..

Em jî, çavdêriya wê serdemê dikin. Eger em li ser vê "waqa-î newî civakî" bi berfirehî ranewestin, ya rastî, em, hem suc dikin, hem gunehkar dibin. Ev karekî "ferz-î wacib e" û karekî entelektuelî ye.

Bêguman başên dojeha Dantê her dem hene. Serdema me jî, tejî beşên dojehî ne. Lewma, binbarî û berpirsiyariya rewşenbîriya Kurd zêde ye. Wek Sartre dibêje, rewşenbîriya Kurd nikare bi "teknîsyeniya zanistê" haraket bike. Ev pîvan e. Kî ji rewşenbîrên Kurd, bi "teknîsyeniya zanistê" haraket bike, wê bibe amurê meşrukirina faşîzma li Kurdistanê. Marx jî dibêje; "feylesofî ne tenê nirxandin e, ya pêwist guhertina wê ye." Ocalan, bi feylesofiya xwe, hem nirxand, hem guhertin kir. Ev pratîzekirina xewn û xeyalên Ehmedî Xanî ne. Ehmedê Xanî, "manîfestoya hebûnê" nivîsî ye, bi saya Ocalan, wek paradîgmeya sedsalê kete pratîkê. Lê dibin tecrîdê de tê girtin.

Em dubare bikin: Tecrîd ne tenê gotinek e, ne kesayetî ye... Tunekirina "manîfestoya hebûnê"ye, vegera li dojeha Dantê ye, kuştina utopya ye. Ji bo vê yekê, întelijansiya Kurd mecbur e bi radîkalîzma rewşenbîrî haraket bike. Wajî vê, îxaneta li hemberî Ehmedê Xanî ye.

Rastî Yek:Pirsgira Kurd bi beden, bi can bûye, di arêna siyasî ya cîhanê de zindî bûye, di kulîsan da nîqaşan dike. Divê întelîjansiya Kurd, di vê zindîbûnê de, di van kulîsan de hebe.

Rastî Du:Cîhanek nû ava dibe û di vê cîhana nû de Kurd hene. Divê destîniya rewşenbîriya Kurd jî, bi destîniya cografya Kurdistanê ve girêdayî be. Ji bo vê jî, dive întelîjansiya Kurd, tecrîdê bikê neynika dilsoziya rewşenbiriya xwe.



# Em ê li hember êrîşan li ber xwe bidin

**Piştî ku dewleta Tirk û bi çeteyên xwe bajarê Efrînê dagirkirin bi sedhezaran welatiyên Efrînê ji ber êrîşên wan Efrîn terikandin. Gelek welatî di dema derketina Efrînê de rastî buyerên cuda hatin. Jina bi navê Emîne Hac Reşîd jî dema ku ji Efrînê derdikeve di rê de tê bombebaran kirin û birîndar dibe. Emîneyê diyar kir ku ew ê serê xwe li ber êrîşan netewînin.**



Emîne û neviya xwe Fatme, êş û kederên bajarê xwe hilgirtin û neçar man koçber bibin. Her duyan diyar kir ku tiştên lê rast hatine nayên jibîrkirin û wê serê xwe ji êrîşan re netewînin.

Artêşa Tirk a dagirker piştî ku bajarê Efrînê dagir kir bû sedema gelek êş û çîrokên xembar. Bi sedhezaran welatiyên Efrînê neçar man ji Efrînê derkevin.

Jina bi navê Emîne Hac Reşîd jî yek ji wan jinan de ku neçar ma ji ber êrîşên dagirkeriyê Efrînê biterikîne.

Emîne Hac Reşîd (59) ji şêniyên gundê Hac Xelîl ê girêdayî navçeya Raco ya Efrînê ye û dapîra 28 neviyan e.

Ji ber êrîşên dagirkeriyê yên li dijî Efrînê de, Emîne neçar ma ku ji Efrînê derkeve, dema ku digihîjin çiyayê Ehlam, li gundê Basûtê ji aliyê artêşa Tirk ve hatin bombebarankirin. Der barê mijarê de Emîne wiha dibêje: "Ez bi tiştekî nehesiyam, tenê min dît ez li erdê me û hemû laşê min bûye xwîn, dest û lingên min şikestin, 2 neviyên min û hevjînê min ku parçe lê ketibûn, bi min re bûn."

Di cih de Emîne bi erebeyeke sivîlekî rakirin bajarê Nûbil.

Bijîşkan destnîşan kir ku rewşa wê her roj xirab dibe, divê derman bikin û heqê dermankirinê bi 500 hezar lîreyên Sûriyê ye.

Malbata Emîne jî nikaribûn ev qas pere bida, berê xwe dan nexweşxaneyên bajarê Helebê.

Emîne di nexweşxaneyên Helebê de 10 rojan ma, 3 mehan di cebsînê de ma û nikaribû rûnişta yan jî bimeşiya.

Dema ku bijîşkan tedawî ji destê wê re kirin, şaşiyeke tenduristî tê de derket, niha jî pêwîst e tedawiyeke din ji destê wê re bê kirin û heqê wê 650 hezar e.

Piştî ku Emîne ji nexweşxaneyê derket, tevî hevjîn û neviyê xwe berê xwe da taxa Şêxmeqsûd ku dermanê xwe bibîne û tevî ku 6 meh derbas bûne jî nikare bimeşe.

Komîna taxê hemû pêdiviyên Emîne û malbata wê bi cih anîn.

Piştî ku hemû malbata Emîne Hac Reşîd gihaştin herêmên Şehbayê, mayinek bi neviya Emîneyê Fatime Ibrahîm (14) ve teqiya, di encamê de lingê wê yê rastê qut bû.

Fatime jî rakirin nexweşxaneyên Helebê ku derman bikin û lingekî îstinayî jê re peyde bikin da ku bikare li ser bimeşe.

Emîne berxwedana xwe wiha tîne ziman: "Em serê xwe ji êrîşan re natewînin û dest ji rêgezên xwe bernadin."…*ANHA*

## Kongreya Star li dijî êrîşan banga tekoşînê li jinan kir




Derbarê jina bi navê Reşa Bisîs a ku li Cerablûsê ji aliyê çeteyan ve hat qetilkirin de Kongreya Star daxuyanî da.

Dîmenê qetilkirina Reşa Bisîs a ku ji aliyê çeteyan ve hat qetilkirin li ser medyaya civakî hatibû belavkirin. Têkildarî mijarê de Kongreya Star daxuyaniya nivîskî da. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku divê rêxistinên mafên mirovan qaşo yên ku banga mirovahiyê dikin, li hemberî dagirkeran û faşîstan helwestek xwe ya cidî raber bikin, da ku karesatên li ser jinan û civakê bi dawî bibe.

"Roja 21'ê mehê dîmenek ku tê de jineke ciwan bûye qurbaniya çeteyan, hate belavkirin. Çeteyan destdirêjî li jina ciwan a bi navê Reşa Besîs li herêmên dagirkirî li Cerablusê kir. Lê ji ber ku jina ciwan li ber xwe da, çeteyan ew teşhîr kir. Birayê jina ciwan ku ew jî bi xwe çete ye, bi awayekî hovane ew qetil kir û ev kiryar wek lekeyeke reş di dîroka mirovahiyê de ye.Dagirkeriya Tirk îdiayên qaşo wê li herêmên dagirkerî ewlekariyê pêk bîne, lê bi rêya vê dîmena ku li ser toreyên civakî hate belavkirin, careke din derew û rastiya dagirkeriya faşîst û zîhniyeta faşîst a li ser civakê û jinan derket holê. Erdogan dixwaze tolê ji destkeftiyên jinan di vê şoreşê de bistîne. Mînaka herî berbiçav jî tişta ku li Efrînê çêbû, hemû bûyer û şîdeta plankirî ya li ser jinan xwe dispêre heman zîhniyetê û ew jî şikandina îradeya jinan e. Li Efrînê bi awayekî hovane êrîşî deskeftiyên jinan kirin ku xwe bi fikrên azadî, aştî û metoda rêber Apo têr kirine.

Ev ne cara yekemîn e ku rewşên bi vî rengî di bin sîwana zîhniyeta faşîst de çê dibin, dixwazin vê zîhniyetê bi hebûna şer biparêzin. Jin her li hemberî zilm û şîdetê disekinin, ji bo şikandina morala wan, sûcên bi vî awayî pêk tînin da ku tirsê bixin nava dilê wan û wan bê hez bikin da ku tiştên heyî qebûl bikin. Li ser vî esasî em vî sûcê li dijî jinan şermezar dikin û em piştgiriyê didin hemû jinan. Her wiha em bang li hemû jinên Sûriyê dikin ku li dijî sûcan bisekinin û serê xwe li hemberî faşîstbûnê netewînin û li ber xwe bidin da ku dagirkeriyê tune bikin.

Em wek Kongreya Star li Rojava bi tundî sûcên li dijî jinan şermezar dikin, her wiha em ji rêxistinên mafên mirovan qaşo yên ku banga mirovahiyê dikin dixwazin ku, li hemberî dagirkeran û faşîstan helwestek xwe ya cidî raber bikin, da ku karesatên li dijî jinan û civakê de bi dawî bibin."

## Mala sêwiyan bi navê "Keske Sora Alan" hat vekirin

Weqfeya Jina Azad a Rojava li Kobanê yekem mala sêwiyan bi navê"keske Sora alan" vekir.

Armanca vekirina mala sêwiyan ew ku ku xwedî li zarokên malbatên xwe di şer de winda kirine derkeve.

Weqfeya Jina Azad a Rojava bi merasîmekê yekem Mala Sêwiyan vekir.

Bi dehan welatiyên bajarê Kobanê, tevî nûnerên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, endamên saziyên sivîl û Weqfeya Jina Azad a Qamişlo beşdarî merasîmê bûn.

Di merasîmê de, li ser navê Desteya Jin a Kantona Kobanê Feryaz Berkel, Weqya Jina Azad a Kobanê Zozan Misto, Desteya Jin Herêma Cizîrê Ariya Osman û bi navê Weqfa Jin a Kantona Qamişlo Avaşîn Rumet axaftin hatin kirin.




Di axaftinan de vekirina mala sêwiyan hate pîrozkirin û hate gotin ku welatiyên herêmê wê xwedî li van zarokan derkevin û wê wan di her aliyan de perwerde bike.

Mala Sêwiyan a "Keske Sora alan" ji aliyê dayika Fatima Misto ve hate vekirin.

Mala Sêwiyan wê 50 zarokan bihewîne, zarok ji aliyê 18 jinan û hejmareke mamoste wê werin xwedîkirin û perwerdekirin. Zarok wê dewreyên perwerdeyên çandî, zimanên Erebî, Kurdî û Îngilîzî bibînin û her wiha zarok wê fêrî bikaranîna komputer, huner û werzîşê jî bibin…*ANHA*

## Dem dema Bêrîtanbuyînê ye



**Avesta AMARGÎ**

Em dikevin sala 26. ya şehadeta fermandara mezin Bêrîtan angu "Gulnaz Karataş". Ev dîrok di heman wextê de dibe dîroka ava kirina artêşa jin li Kurdistanê. Rêber Apo, bi şehadeta fermandara mezin û lêgerîna heqîqetê Bêrîtan re dendika yekemîn ya artêşa jin davêje. Di demeke ku li Kurdistanê hêdî hêdî çirûskên ronahiyê diteyîsîn, çiyayên Kurdistanê bi govenda keçan, xwe xemilandibûn. Di rastiya gelê Kurdistanê de hêj xeyala hêzeke parastina Kurdistanê nehatibû ava kirin an jî kesî bawer nekir wê şerê gelê şoreşgerî li Kurdistanê mayînde bibe, navê artêşa jinan li Kurdistanê digeriya. Ev gavekî şoreşî bû, angu şoreş bi xwe bû.

Di sala 1992'an de dewleta Tirk bi alîkariya hêzên navnetewî, hêzên paşverû yên herêmî û bi desteka Kurdê ji hebûna xwe ya netewî biyanî ye şerekî dijwar angu operesyona li navê qedandina PKK'ê da meşandin. Dijmin weke her car çav sor kiribûn û bi awayekî hovane êrîşî gerîla kir. Hêzên PDK'ê, bi awayekî herî aktîv cihê xwe di vê şerî de digirin. Angu em karin bêjin xeta îxanetê carekî din bi rû reşiya xwe li ser kar bû. Di wan salan de zanebûna netewî li her çar perçeyên Kurdistanê gelekî lewaz bû. Di roja îro de dema ku behsa şerê 92'an tê kirin raste rast di hişa me hemûyan de xeta îxanetê ya ku PDK'ê pêşengtiya wê dikir û bi ser xwişk û birayên xwe de diçû tîne bîra me. Di wan salan de gerîlabûyîn hêj di dema ceribandinê de bû. Tevgera azadiyê, salên 90'î weke salên herî dijwar yên tekoşînê bi nav dike. Dewleta Tirk hêj wê demê îtîbara xwe ya leşkerî, mezinahî dewletî li hemberî gerîlabûna di Kurdistanê de mezin dibû bi bin ketibû.

Her civak an jî gelek, li ser dîroka xwe ya borî pêşeroja xwe diyar dike. Eger îro li her çar perçeyên Kurdistanê jina Kurd xwe bi rêxistin kiriye û bûye artêş bingeha xwe ji ked û tekoşîna Bêrîtanan digire. Gelê Kurdistanê û bi taybetî jina Kurd, Jina tekoşer û berxwedêr Bêrîtan, bi çêkirina Filma Bêrîtan re hêj baştir nas kir. Rêber Apo, sekna Bêrîtan, li hemberî xeta îxanetê, weke sekin û xeta berxwedanê pênase kir. Fermandar Bêrîtan, di gerîla de ne kevin bû û ne xwedî gelek ezmûnên gerîlatiyê bû. Lê rastiyek di ruhê Bêrîtan de veşartî bû. Ew rastî, rastiya Besê û Zarîfeyan bû. Ew rastî rastiya Rindêxan, Leyla Qasim û heqîqeta Sarayan bû. Sekna Bêrîtan, li hemberî nûkerên Kurdistanê da raber kirin, sekna jina Kurd ya ku tu caran ji dijminê xwe re teslîm nabe û di oxira parastina hebûna welat û gelê xwe de canê xwe feda dikê ye.

Li Kurdistanê, bi hezaran Bêrîtan ji nûve zayîn û îro li ser rêya Bêrîtan dimeşin. Li ser her çiyayekî Kurdistanê, li Rojava, Rojhilat û Başûr jinên Kurd herikîn ber bi tekoşînê. Gelê Kurd û jina Kurd di serdema Bêrîtanbûyînê de dijîn. Çawa ku Bêrîtan, di wê demê de xeta îxanetê bi bin xist îro jî li Efrînê weke berdewamiya xeta Bêrîtanan, Avesteyan ala berxwedanê dewir girt û li hemeberî hişmendiya dixweze Kurdê azad teslîm bigire heta kêliya dawî li ber xwe da. Xeleka dîroka berxwedanê ku bi Sarayan dest pê kir, bi Bêrîtanan re bû artêş, bi Zîlanan re xwe gîhand xeta fedaîtiyê û îro bi Avestayan re xwe gîhand ruhê berxwedana serdemê.

# Li Îdlibê av ji nûve germ dibe

**Rûsya û Tirkiyê li hev kiribûn ku heta 15'ê Cotmehê li Îdlibê herêma tampon ava bibe û çete wê ji herêma mijara gotinê vekişiyana. Tevî ku wexta hatiye diyarkirin temam bûye, hîn peyman bi cih nehatiye anîn. Hêzên rêjîma Sûriyê jî wê herêmê dest bi tetbîqatê kirin. Çavkaniyekî leşkerî yê Sûriyê diyar kir eger cîhadîst ji herêmê venekişin, wê rojên bê operasyon dest pê bike."**

Rûsya û Tirkiyeyê li hev kiribûn ku heta 15'ê Cotmehê li Îdlibê herêma tampon ava bibe, lê tevî ku hefteyeke di ser re derbas bûne, aliyan xwe ker kirine. Rejîma Sûriyeyê jî li herêmê dest bi tetbîqata leşkerî kir.



Li gorî peymana navbera Tirkiye û Rûsyayê ku 27'ê Îlonê hate îmzekirin, komên çete yên li Îdlibê diviyabû heta 15'ê Cotmehê çekên xwe yên giran ji herêmeke 15 heta 50 kîlometreyî derxînin û xwe ji vê herêma tampon vekişînin.
Rejîma Enqereyê îdîa dike ku çeteyên wan çekên xwe yên giran vekişandine, lê belê ti çavkaniyeke serbixwe ev agahî piştrast nekiriye.
Li gorî agahiyên ji herêmê hatine girtin, Heyet Tehrîr El Şam (Nusra) ku beriya niha eşkere kiribû ku wê ji herêmê venekişe, hîn jî li herêmê ye. Tirkiye bi berpirsyariya fermî ya van çeteyan radibe.
Tevî ku wexta hatiye diyarkirin temam bûye, hîn peyman bi cih nehatiye anîn. Lê Tirkiye û Rûsya hewl didin tabloyeke xweşbîn nîşan bidin. Ev hêzên ku bêyî daxuyaiyeke fermî ji bo herêma tampon demeke din dane xwe, vê carê wê roja 27'ê Cotmehê civîneke bilind pêk bînin.

**DEM QEDIYA, CIVÎNEKE NÛ DIKIN**

Civîna bilind wê 27'ê Cotmehê li Stenbolê pêk were û hate gotin, wê Serokkomarê Fransayê Emmanûel Macron, Serokwezîra Elmanyayê Angela Merkel, Serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn û Serokkomarê Tirk Recep Erdogan tevlî bibin.
Rojeva sereke ya civîna bilind wê Îdlib be. Serokkomarê Fransayê diyar kir ku wê tevlî civîna bilind bibe, lê belê hişyarî da û got, eger li Îdlibê operasyon were kirin wê beşdarî civînê nebe. Merkel jî piştrast kir ku wê tevlî civîna bilind bibe.

**DEST BI TETBÎQATA LEŞKERÎ KIR**

Çend roj beriya pêkhatina civîna bilind, generalekî girîng ê artêşa Sûriyê hat baregeha hewayî ya Ebû Zûhûr a li rojhilatê Îdlibê. Fermandarê yekîneya bi navê Hêzên Dîcleyê general Suheyl El Hasan ferman ji artêşa Sûriyê girt ku li vê eniyê bi cih bibe. El Hasan tevî fermandarên din li vê eniyê dest bi lêkolînê kir. Li gorî medyaya Sûriyê, wezîfeya van fermandaran destpêkirina operasyonê ye ku bi peymana Tirk-Rûs hatibû rawestandin.
HTŞ'ê ragihand ku wê çekên xwe teslîm neke. Hêzên hikumeta Sûriyê jî zexta xwe ya li herêmê zêde kirin û li vê eniyê dest bi tetbîqatê kirin. Tê gotin balafirên keşfê jî li ser herêmê digerin.
Çavkaniyekî leşkerî yê Sûriyeyî got, "Eger cîhadîst ji herêma ji leşkeran hatiye xalîkirin xwe venekişîne, wê rojên bê operasyon dest pê bike." Lê belê demeke diyarkirî neda.

## Projeya Tevgera Azadî ji bo çareseriyê girîng e



Siyasetmedarê Başûrê Kurdistanê Mihemed Emîn Pênciwênî diyar kir ku projeya Tevgera Azadî weke projeyeke demokrasiya nîştimaniye. Pênciwînî diyar kir ku ev proje weke nîşaneya îradeya gelê Başûrê Kurdistanê ye, ji bo bi cih anîna vê projeyê jî pêwîste ji aliyê sazî, aliyên siyasî û medenî ve kar bê kirin.
Di 17'ê Cotmeha 2018'an de Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistan bi pîrozbahiyekê 4'emîn salvegera damezrandina xwe pîroz kir. Di pîrozbahiyê de projeyek ji bo çareseriya pirsgirêkên Iraq û Herêma Kurdistanê pêşkêşkir.
Siyasetmedarê Başûrê Kurdistanê Mihemed Emîn Pêncwênî di derbarê projeya Tevgera Azadî de axivî û diyar kir ku ev proje wê ji bo çareseriya pirsgirêkên Iraq û Herêma Kurdistanê pêngavek girîng be.
Pênciwênî got; "Projeya Tevgera Azadî weke projeya demokrasiya nîştimaniye. Wê bandorê li ser hest û îradeya gelê Başûrê Kurdistanê bike. Ez di wê hêviyê deme ev proje bi siyasetek demdirêj û aştiyane bigihe armanca xwe. Bi taybet di projeyê de behsa ava kirina lijneyekê ji bo nivîsandina destûrê tê kirin, ev xalek girînge. Ez di wê hêviyê deme ji bo vê lijneyê kar bê kirin."
Pênciwênî ji bo bicih anîna vê projeyê jî wiha got; "Pêwîste ev proje ji aliyê partiyên Başûrê Kurdistanê ve giring bê dîtin. Bi taybet jî ew partiyê giringiyê didin projeyên xelkê. Weke pêwîst jî divê Tevgera Azadî komisyonek ava bike û serdana aliyên siyasî bike. Ji bo bikaribe gav bi gav vê projeyê bicih bîne."...*ROJNEWS*

## Stratejiyeke xurt a muxalefetê wê bandorê bike

Serokwekîlê Koma HDP'ê Ayhan Bîlgen diyar kir ku li gel gefên Erdogan ên li dijî partiya wan, wê encamên hilbijartinê ji aliyê gel ve diyar bibe. Bîlgen got, "Eger mûxalefet karibe bêzariya ji nava civakê ji holê rake, wê bi ser bikeve."
Serokwekîlê Koma HDP'ê Ayhan Bîlgen diyar kir, desthilatdariya AKP'ê mîna her carê ji bo hilbijartinên herêmî dest bi kiryarên xwe yên antî demokratîk kiriye û diyar kir, li gel van kiryaran jî encama hilbijartinê wê ji aliyê gelan ve bê diyarkirin.
Bîlgen li ser gefên Erdogan ên li partiya wan dixwe, operasyonên destgîrkirinê yên li dijî partiya wan û hilbijartinên herêmî axivî.
Bîlgen kiryarên antî demokratîk ên AKP'ê yên beriya hilbijartinên bihurî bi bîr xist û diyar kir, desthilatdarî wê van kiryarên xwe di vê hilbijartinê de jî bidomîne.
Bîlgen diyar kir, desthilatdarî ditirse ku di nava şert û mercên asayî de tevlî hilbijartinê bibe wê têk biçe û got, "Hem bandora krîza aboriyê ku ji aliyê desthilatdariyê ve hatiye afirandin, hem jî şaşitiyên ku di polîtîkayên derve û hundir de tê kirin, desthilatdariyê dixe nava zor û zehmetiyan. Lewma, ji bo aloziyên ku karibe krîza aboriyê pê binixumîne û girseya xwe bi rê ve bibe, hewl dide dijminatiyan biafirîne. Ji ber vê yekê, HDP'ê ne weke partiyeke qanûnî ya ku mafê xwe yê demokratîk bi kar tîne, wê weke partiyeke li derveyî siyasetî nîşan dide."
Bîlgen da zanîn, ya ku encamên hilbijartinê diyar bike, wê plan û kiryarên desthilatdariyê nebe û wiha dewam kir: "Ya ku bandora xwe li encaman bike wê stratejiya xurt û encamgir a mûxalefetê be. Eger serî li ber tirsê were tewandin, eger teslîmî vê sîstemê bibe, bêguman wê derfet nebe ku alternatîfek were afirandin. Lê eger rewşeke berevajî vê derkeve holê, yanî stratejiyên ku bêzariya li nava civakê ji holê rake were afirandin, alternatîf û hêviyên bû bên afirandin, wê bi hilbijartinên herêmî re atmosfereke ku sîstema hatiye afirandin bê nîqaşkirin, derkeve holê."

**PÊWÎSTÎ BI YEKÎTÎ Û BIRYARDARIYÊ HEYE**

Ayhan Bîlgen diyar kir, AKP'ê zûde dest bi karê ji bo hilbijartinên herêmî kiriye û vî karî jî bi polîtîkaya reşkirina HDP'ê dike.
Bîlgen diyar kir, gotinên Erdogan ên li dijî HDP'ê hewldana ji bo dîzaynkirina HDP û pêkhateyên wê ye û got, "girîng e Kurd li dijî vê yekê bi hev re tevbigerin û biryardariya ji bo rêvebirina xwe bi xwe, nîşan bidin."



## Rêveberiya nû ya PADÊ soza bilindkirina têkoşînê da

Rêveberiya Partiya Azadî û Demokrasiya Êzidiyan (PADÊ) piştî 2. kongreya xwe yekemîn civîna xwe lidar xist. Di civînê de Emer Saleh careke din bû Serok PADÊ.
Di 20'ê Comtehê de 2. Kongreya Partiya Azadî û Demokrasiya Êzidiyan (PADÊ) bi beşdarbûna 300 delegeyan pêk hat. PADÊ piştî 2. kongreya xwe li bajarokê Xaneserê ya Şengalê civîna xwe ya yekemîn pêk anî. Piştî civînê bi daxuyaniyeke çapemeniyê serok û cîgirên nû yên PADÊ hatin eşkere kirin.
Serokê PADÊ yê berê Emer Saleh dîsa weke Serokê PADÊ hate hilbijartin. Azad Ebdal ku xelkê Başîka ye wek cîgirê yekem û Xemê Berkat a ku 3 salan dîl di destê DAIŞ'ê de mabû û piştre hatibû rizgarkirin weke cîgira duyemîn hate hilbijartin.
Serokê PADÊ Emer Saleh di civîna çapemeniyê de axivî û soza şopandina sozên ku ji bo gelê Êzidî beriya niha dane da û got, "Em carek din soza xwe ya ji bo xizmeta gelê xwe nû dikin. Heta ku em hemû mafê gelê xwe bi dest nexin, em ê kar û xebatên xwe berdewam bikin."
Emer Saleh bang li hemû partiyên Êzidiyan kir ku destên xwe bidin hev, yekîtiya xwe bihêz bikin û neyên xapandin.
Cîgira Serokê PADÊ Xemê Berkat axivî û got, "Ez wek keçek Êzidî ku 3 salan di destê DAIŞ'ê de mam, ez soz didim heya dawî tişta ku ji destê min bê ji bo gelê xwe û bi taybetî ji bo jinên di destê DAIŞ'ê de dîlin bikim."
Hevserokê Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Hisên Hecî jî wiha axivî; "Em hêvîdarin PADÊ weke partiyek Êzidiyan xizmeta gelê bike û bikare hemû mafên civaka me bi dest bixe."
Hisên bang li hemû aliyên Êzidiyan kir ku xwe ji bo hilbijartinên Encûmenên Parêzgehan amade bikin…
*ROJNEWS*



# Amêdiyê bûye navenda MÎT'ê

**Dewleta Tirk xaka Başûrê Kurdistanê kiriye navenda îstixbarat û karê sîxûriyê yê MÎT'ê. Li gor nûçeya di rojnameya Jiyan de Dewleta Tirk li bajarokê Amêdiyê yê Başûrê Kurdistanê 5 navendên MÎT'ê ava kiriye û hemû cûre çekên giran lê bi cih kiriye. Nerazîbûna gelê başûr ya li dijî van baregehên dagirkeriya Tirk jî zêde dibe.**

Dewleta Tirk li bajarokê Amêdiyê yê Başûrê Kurdistanê 5 navendên MÎT'ê ava kiriye û hemû cûre çekên giran lê bi cih kiriye.
Li gorî belgeya rojnameya Jiyan a di hemjara 63'ê ya roja yekşemê belav kirî de, dewleta Tirk êrîşên dagirkirina xaka Başûrê Kurdistanê berfireh kiriye û xaka Başûrê Kurdistanê kiriye navenda îstixbat û karê sîxûriyê yê MÎT'ê.
Di belgeya Rojnameya Jiyan parvekirî de Teşkîlata Îstixbaratê ya Mîllî ya Tirk (MÎT) li bajarokê Amêdiyê yê ser bi bajarê Dihok ê Başûrê Kurdistanê 5 navendên MÎT'ê ava kiriye û her cûre çekên giran lê bi cih kiriye. Her wiha balafirgeha li herêmê jî ji bo bombebarankirina gerîlayên PKK'ê ên li herêmê seferber kirine.




**BAREGEHÊN LI AMÊDIYÊ**

Li gorî heman belge û nûçeyê, MÎT'ê baregehên sereke li seranserê bajarokê Amediyê ava kiriye, dîsa baregehek li Sîrê ya bajarokê Şêladiz, yek li Girê Bardoz û yek jî li devera Kanî Masiyayê hatiye avakirin.
Rojname ev agahî jî parve kir: "MÎT'ê balafirgeha Bamernê jî kiriye cihê îstixbarat û sîxûriyê. Her wiha li van baregehan çekên giran ên mîna tank, top, hewan, wesayîtên zirxî û helîkopter hatine bicihkirin."
Rojnameyê ragihand ku balafirên bê mirov û helîkopterên artêşa Tirk jî ji balafirgeha Bamernê difirin û xaka Başûrê Kurdistanê bombebaran dikin.
Têkildarî mijarê Berpirsê Komelgeha YNK'ê Hawar Amêdî jî ji rojnameyê re axivî û hebûna baregehên sîxûriyê yên MÎT'ê yên li herêmê piştrast kir. Amêdî got, "Hebûna van baregehan bûye sedem ku rûyê geşt û betlaneyê yê herêma Amêdiyê nemîne û welatî ji bo betlaneyê serdana herêma Amêdiyê nekin."

**'WELATIYÊN HERÊMÊ NERAZÎ NE'**

Amêdî bal kişand ser nerazîbûnên gel ên li dijî van baregehan û got: "Hebûna van baregehan bûye sedema nerazîbûnên welatiyên herêmê. Li dijî van baregehan û êrîşên dewleta Tirk her çendî xwepêşandan hatibin kirin jî lê ne hikûmeta Herêma Kurdistan û ne jî Encûmena Nûnertiya Iraqê pirsgirêk çaresernekiriye."...*ANF*


## Şoreşa Rojava berhema ramanên Ocalan e





Rewşenbîrên navçeya Dirbesiyê bêdengiya rêxistinên mafên mirovan û tecrîda giran ku dewleta Tirk li ser Ocalan ferz kiriye, şermezar kirin û wiha got: "Şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê bi saya ramanên Ocalan bi ser ket."
Rewşenbîrên navçeya Dirbesiyê derbarê tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de axivîn û tecrîd şermezar kirin.
Helbestvan Mistefa Şêxmûs tecrîd şermezar kir û wiha got: "Dewleta Tirk bi rêya siyaseta qirêjî ku li ser Rêberê Gelê Kurd dimeşîne, dixwaze raman û felsefeya wî ji holê rake. Lê her kes dizane şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê bi saya projeya Neteweya Demokratîk ku encama ramanên Ocalan e, bi ser ket."
Şêxmûs destnîşan kir ku bêdengiya navdewletî ya li dijî kiryarên dewleta Tirk, nîşan dide ku ew jî şirîkên sûcên dewleta Tirk in.
Nivîskar Rûken Yûsif bi lêv kir ku rejîma Tirkiyê hewl dide bi zext û tecrîdê gelê Kurd dûrî rêber Ocalan bike, lê bi milyonan gelê Kurdistanê li ser fikrên Ocalan dimeşin."
Her du rewşenbîran bang li rêxistinên hiqûqî û Neteweyên Yekbûyî kirin ku zextê li dewleta Tirk a faşîst bikin ku tecrîdê li ser Ocalan rakin."...*ANHA*

## Bê Kurd û demokrasî li Sûriyê çareserî nabe



**Zekî BEDRAN**

Li Sûriyê aşitî û çareseriyê hê teşe negirtiye. Lêgerîn û nîqaş hene. Lê li naverastê proje û hevpariyeke cidî tune ye. Herêma Bakur a Sûriyê bingeha modela herî demokratîk û bi ewle danî. Lê ev herêma fireh û gelên wê li derveyî hemû platforman hatine hiştin. Herkes vê yekê bi dewleta Tirk rave dike. Rûsya û Emerîka jî di navê de dibêjin ku Tirkiyê Kurd û tevahiya bakur bloke kiriye. Balkêşe, planeke DYE û Rûsyayê a Sûriyeke demokratîk tune ye.

Tirkiye li şûna çareserî û aşitiyê hewl dide şer derbasî herêmên Kurdan bike û gelan bi hev bide qirkirin. Vê yekê bi awayekî eşkere dike. Ji aliyekî de hewl dide ku li Îdlibê şer çênebe, ji aliyê din ve, ji bo êrîşî Minbicê û herêmên rojhilatê Firatê bike raya giştî ava dike. Tirkiyeke wiha ti carî demokrasiyê naxwaze. Bi çeteyên çekdar yên ku ji Ereban û Asya Navîn komkiriye hewl dide şerê navxweyî kûr bike û Kurdan ji Sûriyê paqij bike, yanî komkujiyê bi encam bike. Tirkiye wiha çareseriyeke ku Kurd di nav de bin qebûl nake. Ev tê fêhmkirin.

Ya nayê fêhmkirin helwesta tifaqên ku DYE û Rûsya serkêşiya wê dikin. Tirkiye xwediyê Sûriyê nîne. Mafê wê tune ye ewqas têkelî karên navxweyî yê Sûriyê bibe. Bi taybet berjewendîparêziya Rûsyayê ya ku Îflah nabe Tirkiye xist nava Sûriyê. Weke ku Tirkiye kir hevparê Sûriyê. Herî dawî pêşkêşkirina Efrînê ji dagirkeriya Tirk re wê weke pratîkeke şermê derbasî dîrokê bibe. Bazarên veşartî erdên Sûriyê pêşkêşî Tirkiyê kir û rê vekir ku li ser Kurdan paqijiya etnîkî were kirin.

Rûsyayê Kurd vexwend Soçî yê. Kurdan û derûdorên din lîsteyên navan radestî Rûsyayê kirin. Lê Rûsyayê bi Tirkiyê re lihevkir û careke din li yên ku vexwendibûn negeriya. Weke ku tiştek wiha nebuye tevgeriya û paşê jî Efrîn ji dagirkeriyê re vekir. Rûsya bi vê helwesta xwe wê çawa baweriyê bide gelên Sûriyê? Wê kîjan çareseriya demokratîk pêşkêş bike? Herêmên ku bi dest xistine weke ku qet tiştek nebuye didin rêjîma Baas. Weke ku ti pirsgirêka gel bi rêjîma Baas re tune ye tevdigerin. A herî xirab jî bi Tirkiyê re li hev dikin û li dijî Bakurê Sûriyê serî li polîtîkayên fitneyê didin. Qaşo DYE li Bakurê Sûriyê dewletekê ava dike. Lê belê Kurd herdem bi Rûsyayê re di nav danûstandinan be bûn. Bi Rûsyayê re li ser destûreke çawa dixwazin, gelek nîqaş kirin. Di ti belge û hevdîtinan de Kurdan behsa avakirina dewleteke cuda nekirine. Kî dikare îdia bike, Rûsyayeke ku hewl didie Tirkan sor bike, şer berbelav bike û jê berjewendiya bi dest bixe, destûreke demokratîk dixwaze? Dema bi dewleta Tirk re di nava peyman û bazariyeke wiha de be aşitî û demokrasî nayê Sûriyê. Ger bê ew ê şer û bela bê.

Di helwesta DYE û hêzên Koalîsyonê de zelaliyek tune ye. Bi hêzên Bakurê Sûriyê re tenê hevpariya leşkerî dikin. QSD'ê li Rojhilanavîn li dijî DAIŞ'ê şerê herî hevgirtî kir. Lê daxwazên van hêzan yên siyasî negirtin rojeva xwe. Ew komên berbelav ku berhev kiribûn û zêde bandora wan tune ye tevlî hevdîtinên Cenevê kirin lê Kurd û hevparê wan tevlê nekirin. Helwesta DYE û yên li cem wî jî weke helwesta Rûsyayê bû. Wan jî got, "em nikarin Tirkiyê derbas bikin, Tirkiye bloke dike". Her du hêzên mezin yên cîhanê li hember DAIŞ'ê bi Kurdan re hevkarî kirin lê dema dor hat demokrasî û çareseriyê rêya xwe diguherînin. Ma Tirkiye dikare li Sûriyê çareseriyê bloke bike? Ev hêza wê heye? Rastiyeke ku hemû hêza xwe heta dawiyê bikartîne û dijbertiya Kurd dike. Lê DYE û Rûsya li Sûriyê biryara aşitî û çareseriyê bidin Tirkiye nikare vê asteng bike. Wê bipetbite û mijûl bibe lê nikare asteng bike. Em bala xwe bidinê Tirkiye bi taybetî di mijara Îdlibê de hewl dide DYE'yê bitepisîne. Daîma bi êrîş û dagirkirinê gefan dixwe. Lê heta ku DYE destûrê nede Tirkiye nikare êrîş bike. Ger êrîş bike, emê bizaninku bi DYE'yê re lihevkirine û wan destûr daye. Weke heman ku li Efrînê bû. Rûsyayê qada hewayî vekir, DYE'yê jî got "tiştê ku ez ji bo Efrînê bikim tune ye" û destûr da dagirkirinê.

Tirkiye tenê bi hêza xwe neket Cerablûsê. Dîsa ew hêzên ku me behsa wan kir destûr dan. Îro jî Tirkiye bi tena serê xwe nikare li Sûriyê bimîne. Ger DYE û Rûsya helwestê bigirin Erdogan xwe biperitîne jî ew ê di nava çend rojan de ji Sûriyê were qewitandin. Wisa bi çeteyên çekdar û hêzên paramîlîter welat nikarin werin dagirkirin. Bi êrîşên balafiran gel nikarin teslîm werin girtin. Yên ku Tirkiye xistin Sûriyê eşkereye ku ji bo çareseriyeke demokratîk ji dil nîn in. Li pey serdestî û bi bandorbûnê ne. Ji ber vê destûr nedan ku Kurd û Hêzên Bakurê Sûriyê ku wan re hevpariyê dikin di Cenev û komîsyona destûra bingehîn de cih bigirin. Bi li derve hiştina civakeke dînamîk û demokratîk ku beşeke Sûriyê ya girîng di destê xwe de digire wê kîjan destûr were ava kirin? Hêzên Bakurê Sûriyê hêza Sûriyê ya herî pêşeng û demokratîk e. Yên ku van hêzên li derve dihêlin xirabiyê li Sûriyê dikin. Pêşî li çareseriyê digirin û bingeha şer û pevçûnên nû amade dikin. Ji ber vê hêzên demokratîk yên Sûriyê divê hê zêde di yekîtî û têkoşînê de bi israr û bi biryar bin.